THE DAY AFTER

# Rêbera Asan ya Dozên Kesên Rizgarbûyî/Saxmayî ji Girtinê



اليـــوم التالـــي
لدعم الانتقال الديمقراطي في سوريا

THE DAY AFTER
Supporting Democratic Transition In Syria

# Rêbera Asan ya Dozên Kesên Rizgarbûyî/Saxmayî ji Girtinê

2022

© Hemû maf parastî ne bo rêxistina The Day After

Rêxistina The Day After (TDA) Rêxistineka Sûrîyayî ye li ser piştgirîya veguhestina demokratîk li Sûrîyayê kar dike, û çarçoveya karê wê ev e: Serwerîya qanûnê, dadmendîya veguhêz, çaksakirina beşê ewlekarîyê, dîzaynkirina sîstemên helbijartinan û helbijartina komeleyên damezrêzer, sazkirina destûrê, çaksazkirina aborî û siyasetên civakî.

# Naverok

Pêşgotin ........ 1

Bandorên girtinê yên derûnî û yên li ser reftaran ........ 4

Şermezarî ........ 10

Pênaseyên Qanûnî yên hin binpêkirinan ........ 19

Qewîtî ........ 24

Dûmahî ........ 29



# 01
## Pêşgotin

## Yekem: Pêşgotin

Azadîya Takekesî mafekê li gor qanûnên navdeletî yên mafên mirovan çesipandî ye, nemaze madeya 9an ya Ragihandina Navdewletî ya Mafên Mirovan û Peymana Navdewletî ya Taybet bi Mafên Sivîl û Siyasî, wate, nabe girtina Keyfî der heqê tu mirovî de were bicihanîn.

Girtina keyfî bêyî nîşandana tu rayeyên girtinê yên qanûnî, şêwazekê sereke yê çewsandina protestoyên li Sûrîyayê ji sala 2011an ve, ji hêla Hikûmeta Sûrîyayê ve bû, ev binpêkirin der heqê bi sedhezarên Sûrîyayîyan de hatin bicihanîn ji hêla Hikûmeta Sûrîyayê ve, bi rêya dezgehên ewlekarîyê û mîlîtayên ser bi Hikûmeta Sûrîyayê ve, bi armanca tirsandin û terorkirina Sûrîyayîyan.

Girtin li Sûrîyayê bê raye dihate bicihanîn û girtî bê tu agahî dihatin wendakirin, ji danûstendina bi malbatê û parêzeran bê par diman, desthilatên Sûrîyayî ji hêla xwe ve girtina keyfî înkar dikin, ji lew re, piranîya girtîyan bûn wendayên bizorê, ev yek bû sedema nebûna lîsteyeka navendî ya navên wendayan li Sûrîyayê, û agahîyên der barê hejmara wan de tevlihev bûn, carinan hatiye gotin ku hejmara wan sêsed hezar e û hin alîyan hejmarinên kêmtir dane, li gel ku hejmarên Neteweyên Yekbûyî nîşan didin ku zêdeyî sed hezar girtî ne.

Girtîyên li zindanên Sûrîyayî rastî hemû cûreyên îşkenceyê û reftarên tund, ne mirovî û yên piçûkxistinê, her weha tundîya cinsî ji hêla desthilatên girtinê, bêyî tu çavdêrî an parastineka navxweyî an navdewletî tên, gelek ji wan ji ber îşkenceyê bi awayekê rêxistinkirî hatine kuştin, wêneyên “Caesar”ê jî mînakeka berz a vê yekê ne.

Mijara girtinê li Sûrîyayê bi awayekê cidî li ser asta navdewletî nehatiye çareserkirin, çi bi rêya maseyên danûstendinan, yan bi rêya biryarên navdewletî yên girêdar, xebatên di vê çarçoveyê de, heta nuha, negihaştine tu pêşketineka ber bi serbestkirina girtîyên siyasî an parastina wan.

Armanca vê broşûrê balkişandina ser bandorên derûnî û civakî yê girtinê, awayên danûstendina pê re û nîşandana giringtirîn qanûnên pêwendîdar weke rêberekê bi armanca parvekirina agahî û zanyarîyan e.

**Ev broşûr gaveka yekem e û gelek kar li pêş me heye ji bo pêşxistina gava ku me pê dest pê kiriye.**



# 02

## Bandorên girtinê yên derûnî û yên li ser reftaran

## Nîşanên Derûnî yên Herî Belav

### Bêzarî (Deprîsyon):

Bêzarî yek ji nexweşîyên herî zêde pecan e bi kesên girtî bûn re çêbibe, mirov ji ber wê her dem xemgîn ê, hasten wî neyênî ne û nema guhdanê bi çalakîyê ku kêfa mirovan tînin dike, ji ber rewşên girtinê, û zexta derûnî ya ku girtî rastî wê tê, her weha ji ber îşkence, tirs û şêwazên lêpirsînê yên hovane, çêdibe.

**Nîşanên Bêzarîyê (deprîsyonê)**

- Xemgînîya domdar û daxwaza girî
- Bêhintengî
- Acizî
- Nearamî
- Hestê nerêzdarîyê bo kesayeta xwe
- Hestê gunehkarî û Bêhêvîtîyê
- Nebûna coşê û pabendîya bi kar û jîyana civakî û çalakîyên bêhinvedanê

## Nexweşîya Zexta Paş Trawmayê (PTSD):

Zexta paş trawmayê: nexweşîyeka derûnî ya belav e li gor sîstema cîhanî ya ketegorîkirina pizîşkî bo nexweşîyên derûnî û pirsgirêkên têkildar, zexta paş trawmayê ji ber bûyereka biêş, ezmûneka derûnî ya xirab mîna tundîya malane an erîşeka laşî, an ku şahidê bûyerên siyasî yên xirab mina cengan be, bi mirov re çêdibe. Hêjayî gotinê ye ku Nexweşîya Zexta paş Trawmayê ne tenê bi kesê ku bûyer bi sere wî de hatiye çêdibe, lê dibe bi wan kesên şahid re jî çêbibie û ev nexweşî ne tenê bi grûpeka destnîşankirî ya kesan re çêdibe, dibe ku bi jinan, mêran, mezin û zarokan re çêbibe, yek ji kesên rizgarbûyî ji girtinê Ebdulah e, di şehadeya xwe de dibêje:

> **Kesên girtî, nemaze zarok rastî tirseka zor û nearamîya domdar tên, her weha nikarin razên, ev dibe sedema hilweşîna ku carinan dibe sedema mirinê.**

# Nîşanên Nexweşîya Zexta Paş Trawmayê

## Vegerandina Ezmûnê:

- Xewn û kabûs
- Bersivdayîna laşî dema bibîranîna bûyerê/ zêdebûna lêdana dil/ Xwêdan
- Bersivdayîna hişî dema bibîranîna bûyerê/ xemgînî dema dîtina tişttekê girêdayî bûyerê
- Dûbarekirina hizr û wêneyên xirab yên bûyerê
- Hestê ku bûyer dûbare dibe.

## Xwevedan: hewldana nehizirîn an neaxaftina der barê tişta bûyî

- Xwevedana ji kes û çalakîyên ku bûyerê bi bîra wî ve tînin.
- Nekarîna bibîranîna hin beşên trawmayê.
- Nemana miqatebûnê bi tu tiştî.
- Hestê dûrketina ji her kesî.
- Sarbûna hestan.

## Hişyarîya Zêde:

- Bi hêsanî acizî
- Çavdêrîya bûyerên derdorê
- Nekarîna baldarîyê
- Zehmetîyên xewê
- Bertekên mezin (xweçengkirin dema bihîstina çi dengî be)

## Hin şîretên lênerîna xweyî:

- Dema ku pênc xulekên te hebin, li muzîka hedar û rehetker guhdar bike, da ku tu hiş û bîra xwe ji bûyerê dûr bixî.

- Xwarina tendirust bixwe, nemaze şînahî û ji hişyarkeran dûr bikeve an kêm bike heta tu karibî, ev yek di miqatibûna derûnî û kêmkirina zexta derûnî de alîkar e.

- Meşa sê caran di hefteyê de, her carekê nîv saetê, gelekî giring e, her weha dîtina xweza û asîmanê zextê kêm dike.

- Arazûyeka xwe di warekî de bipêş bixe, mîna mijarekê girêdayî kar, û hin pirtûkan bixwîne da ku tu karibî bihêlî mejîyê te dûrî mijara acizker be.

- Hewl bide teknîkên henasê û rehetkirinê bi kar bînî.

- Di danûstendina xwe de der barê hizr û hestên xwe de, bi hevalên xwe û malbatê re vekirî be.

- Tu dikarî hest û hizrên xwe bi rêya nivîsînê li ser kaxezan vala bike, ev yek alîkarîya te dike da ku tu rehet bibî û nearamîya xwe sivik bikî.

- Hewl bide ku tu dûrî hestên berpirsyarîya takekesî, gunehkarîyê an xwelomkirinê ji alîyê kesên ku rastî reftarên nemirovî tên, dûr bixî, û ji bîr neke tu ne bi tenê yî.

- Hewl bide tu bi xwe re baş bî bi rêya parastina astên xweparastinê yên taybet. Gava ku tu xurttir bî tu dikarî karekê baştir bikî û alîkarîya hejmareka mezintir ya xelkê bikî.

- Piştgirî û rêdana rûhî, hin kesan dîtîye ku xwendina deqên olî û nimêj gelekî alîkarîya wan dikî.



Her tiştê ku di rapora derbarê tenduristiya derûnî (psîkolojî) de hatiye, bi çavdêriya Navenda Cangoriyên Azarîkirinê (CVT) û Pêşeroja Sûriyê ya Gulgulî bûye

- Danûstendina li gel heval, hevkar û malbatê ji bo daxwazkirina alîkarîyê dema ku tu hest bikî bo te hewce ye,

- Wergirtina piştgirîya nefermî ji hevkarên te yên ku li devera te dijîn bi rêya çalakîyên civakî yên praktîk, mîna çalakîyên vêsînê an werzîşê.

- Hin caran danîna têkilîyê li gel pisporan ji derveyî malbata te an karê te, giring e ji bo ronîkirina pirsgirêkan.



# 03

## Şermezarî

## Third: Stigma

### a. Pênaseya Şermezarîyê:

Şermezarî proseyeka civakî ye dibe sedema paşguhkirin an şermezarkirina kesan an grûpan.

Li gor Rêxistina Tendirûstîyê ya Cîhanî, Şermezarkirin dibe ku were pênasekirin weke nîşana şermîyê an neqebûlkirinê, dibe sedema cudakirinê û dûrxistina ji beşdarîya di nava hejmareka mezin ya çalakîyên civakî de, şermezarkirina civakî û cudakirin dikarin bandorê li ser rûmeta xelkê û bawerîya wan bikin.

Meysaa ji girtinê rizgar bûye, di şehadeya xwe de dibêje:

> **Gelek hezkir û hevalên min hebûn ku bi wan re di têkilîyê de bûm, lê ev têkilî piştî girtinê hate guhertin, weke ku şerm dikirin bi min re di têkilîyê de bin.**

Şermezarî dayîna nerînan, lom, cudakirin, sezakirin an piçûkxistina mirov an girûpeka mirovan an civakekê li xwe digire, ji ber taybetmendî an ezmûnekê ku lê tê nerîn weke ku ji derveyî pîvanên cimaeta wan an civaka wan e.

### b. Bandorên Şermezarkirinê:

- Girêdana lomê bi jinan û kontrolkirina reftarên wan û asêkirina wan di malê de û sînorkirina azadîya wan û mafên wan, her weha bikaranîna zewaca bizorê û ya pêşwext weke rêkarên "Parastinê", bandora vê yekê li ser jinan û wekhevîya li ser bingeha cûreya civakî û dadmendîyê heye.

■ Danîna lomê li ser malbatan ji ber hizirên ku rola nêran parastina mêyan e di malbatê de, ev yek dabên civakî yên li ser cûreya civakî diçesipîne, ev yek bi Meysaa re çêbû piştî ku ji girtîgehê rizgar bû, di tecrubeya wê ya dema girtinê û piştî wê:

> **Malbata min, ez bi neçarî ji Sûrîyayê derxistim, ji ber zexta ku derdorê li wan kir, di dema girtina min û piştî wê de.**

■ Tirsa ji şermezarkirinê rêya vegotina bûyerên qewimî û daxwaza alîkarîyê her weha gihaştina dadmendîyê, li ber kesên saxmayî/rizgarbûyî digire.

■ Şermezarkirina ku malbat rastî wê tê dikare girêdanên malbatî hilweşîne û bibe sedema: berdan, dûrketin an zewca bi jineka din.

Her weha şermezarkirin dikare bibe sedema qewitandina saxmayan/rizgarbûyan, an dûrxistina wan ji civakê.

Hin caran dikare bibe sedema bidawîkirina jîyanê, Meysaaya ku ji girtinê rizgar bûye, wisa got:

> **Heta bi hevjînê min, yê ku du zarokên me hene, min bêyî tu gotin berda (bi bedengî, bêyî ku tu sedemê am tu gotinê bibêje, ez berdam, heta bi zarokên xwe jî nema pirsa wan kir û xwe ji jîyana me qut kir) xuya dike wî jî ji ber girtina min li cem rêjîmê şerm kir.**

■ Danîna lomê li ser qurbanîyan û malbatên wan balê dikişîne ser wan li şûna ku bikişîne ser reftarên tawankeran, û dikare bibe asteng li pêş pêkanîna dadmendîyê û lêpirsînê li dijî wan, ev yek jî li ser zimanê Meysaa di şehadeya wê de hate gotin:

> **Cihê mixabinîyê ye ku jinên girtî rastî van reftarên xirab tên û her dem di bin zexta tomet û pirsan de ne.**

- Têkçûna di dîtin û nîşankirina şermezarkirinê li ser asta xweyî, malbatî û civakî de, dê asteng be li himber rehetkirinê û bibe sedema parçebûn û nakokîyên civakî, û rê li ber çi derfeta geşepêdan û avakirina domdar bigire, ji lew re, Îman a ku ji girtinê rizgar bûye, dibîne ku gerek e alîyên çalak mînanî rêxistinan, roleka mezintir ya hişyarîkirina civakê der barê şêwazên danûstendina li gel saxmayên/ rizgarbûyên ji girtinê de bigerîne, û setemkarîya der heqê wan de bûye diyar bike, her weha gerek e malbat û civak vê setemkarîyê li wan zêde nekin û roleka wan a rehetkirina rizgarbûyî/ saxmayên ji girtinê hebe.

## Ji bo guhertinê, dibe ku çi were kirin:

- Danûstendinên li ser hemû astan bi hazirî û beşdarîya saxmayîyan/ rizgarbûyan, dê gelekî bi sûd bin di warê guhertina nerînên xirab yên şermezarkirina wan de.

- Danîna têkilîyê li gel kesên çalak di civakê de, mînanî rûspî û oldaran û kesên cihê bawerîyê, ew dikarin barê guhertina civakî hilgirin ser milên xwe. Behîra ya ku ji girtinê rizgar bûye, dibêje:

> **Nerîneka xirab û kêm li dijî jinên rizgarbûyî ji girtinê heye, weke ku ew jêdera şermê bin, ev nerîn dibe sedema ku ew xwe ji xelkê û jîyana civakî dûr bixin û bi tena xwe bin, ragihandin û rêxistin jî bi rola xwe ya hişyarkirina civakê û nîşandan jinên saxmayî/ rizgarbûyî weke leheng, ranabin."**

- Karê li ser dijatîya şermezarkirinê bi rêya danîna qanûnên alîkar.

## c. Mafên ku ji ber şermezarkirinê tên binpêkirin (Li gor her du peymanên navdewletî):

Bi rêya vî beşî, em giringtirîn mafên ku dibe werin binpêkirin ji ber şermezarkirin, nîşan didin, û xwe dispêrin Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî û Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Çandî û Civakî. Me xwe spartiye her du peymanan ji ber ku Sûrîyayê di sala 1969an de pesend kirine.

### Peymana Navdewletî ya Mafên Medenî û Siyasî:

Peymaneka piralî ye, li gor biryara Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî sala 1966an de hatiye lixwegirtin û di sala 1976an de ketiye warê bicihanîne de.

Ev peyman alîyên girêdayî xwe bi rêzdarîya li mafên sivîl û siyasî yên takekesan pabend dike, ji nav wan jî mafê jîyanê, azadîya bawerîya olî, azadîya derbirînê, azadîya kombûyînê, mafê dengdanê û mafê dadgeh-kirina dadmend.

Sûrîyayê di sala 1969an de ev peyman pesend kir.

### Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî:

Peymaneka navdewletî ya piralî ye, di sala 1966an Komeleya Giştî ya Netewyên Yekbûyî li xwe girt û sala 1976an kete warê bicihanînê.

Peyman alîyên girêdayî xwe bi dayîna mafên aborî, civakî û çandî pabend dike, di nav de jî mafê kar, fêrbûnê, asteka jîyanê ya guncaw û mafê tendirustîyê.

Sûrîya di sala 1969an de ev peyman pesend kir.

Lîsteya jêrîn hin nimûneyên şermezarkirinê û çawa dikare bandorê li ser jîyana kesên ku rastî wê tên bike, diyar dike.

**(Lîste ji Rapora Rêxistina Parêzer û Pizîşkên Mafên Mirovan hatiye girtin)**

| Mafên ku ji ber şermezarkirinê tên binpêkirin (li gor her du peymanan) | Şîroveya li gor rewşa li Sûrîyayê |
|---|---|
| Wekhevîya li ser bingeha cûreya civakî (Madeya 3yem a Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî, Madeya 3yem a Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî) | Tevî ku jin û mêr her du jî rastî şermezarkirinê li Sûrîyayê tên, lê cudakirineka diyar di alîyê cenderî de di nav wan de heye, jin êşa şermezarkirinê ji mêran bêhtir dibînin. |
| Azadî û parastina li dijî cudakirinê (Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî, Her du madeyên 24 û 26) | Di Qanûna Sûrîyayî de, hejmareka madeyên cudaker hene, dibin sedema damezrandina şermezarîyê, di encamê de, li şûna ku şermezarkirinê hilîne, diçesipîne. |
| Mafê Jîyanê (Madeya 6em a Hevpeymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî) | Dibe ku jin ji hêla mêrên malbatê ve rastî kuştinê were, da ku xwe ji şermezarîya girtinê bidûr bixin, her weha şermezarîya girtinê dibe ku bibe sedema xwekuştinê. |
| Mafê Azadîyê û ewlekarîya takekesî (madeya 9em ya Hevpeymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî) | Hin malbat bo xweparastinê xwe dispêrin vê gavê, ku jin û keçan di malê de "Dûrî Tadeyê" dihêlin û wan ji azadîyê bêpar dihêlin, dibe ku hin malbat xwe bispêrin vê rêkarê weke sezayekê an ji bo xwedûrxistina ji şermezarîyê. |
| Mafê hatûçûnê (Madeya 12em ya Hevpeymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî) | Şermezarî dibe sedema sînorkirina tevgera hatûçûna mirovê ku rastî wê hatiye û sînorkirina vê tevgerê dibe ku ji malê be, ku tevgera jinê bi behaneyên "parastinê , rumetê û navûdeng asteng dikin, û dibe ku sînorkirina azadîya tevgerê ji ber sedemên xweyî yên girêdayî mirov bi xwe be, lê piranîya caran sedemên xweyî girêdayî kiryarên ziyandar in ji malbatê an civakê, |
| Mafê pesendkirina qanûnî (Madeya 16em a Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî) | Kêm caran zarokên ku encama destdirêjîya cinsî ne, tên qeydkirin, û nikarin nasnameyê ji dayika xwe werbigirin.<br>Gelek caran jî, navê zarok li ser navê endamekî malbatê tê qeydkirin ku ew (bav) e, tevî ku ev yek nerast e, ji bo xweparastina ji şermezarîya ku zarok dê rastî wê were.<br>Carinan ji bo xweparastina ji şermezarkirina girêdayî girtina jinan, malbat dibêjin ku meriva wan, ji ber çi sedemê be, miriye û nabêjin ku hatiye girtin. |

| Mafên ku ji ber şermezarkirinê tên binpêkirin (li gor her du peymanan) | Şîroveya li gor rewşa li Sûrîyayê |
| --- | --- |
| Mafê taybetmendîyê û mal û malbatê û rizgarîya ji êrîşên neqanûnî li ser namûsê û navdeng (Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî, Madeya 17em) | Şermezarkirin êrîşek e li ser navûdengê mirov û namûsa wî, gelek caran şermezarkirina ku ji ber tundîya cinsî çêdibe, dibe sedema danîna lomê li ser saxmaî/rizgarbûyîyan û danîna berpirsyarîya tawana ku li dijî wan bûye, li ser milên wan û xirabkirina navên wan.<br>Şermezarî dikare bibe sedema ku kesên saxmayî/rizgarbûyî bê mal û malbat bimînin, eger nehatin qebûlkirin an neçar man ku dûr bikevin. |
| Azadîya Derbirînê (madeya 19em a Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî) | Tirsa ji Şermezarîyê rê li ber rizgarbûyî/saxmayîyan digire ku rastîyê bibêjin, her weha rê li ber danûstendin û diyalogê digire ji ber ku civak van mijaran qedexe dibîne. |
| Mafê pêkanîna hevjînîyê û avakirina malbatê (Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî, Madeya 23yem. Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Madeya 10em) | Gelek caran kesên saxmayî/rizgarbûyî, astengîyan di pêkanîna hevjînîyê de dibînin.<br>Dibe ku hin malbat xwe bispêrin mîkanîzmên neyênî yên danûstendina bi şermezarkirinê re, ku keça xwe bi mirovekê temenmezin an astengdar re dizewicînin da ku şerma destdirêjîyê dûrî xwe bixin, her weha dibe ku mêr jina xwe berde û wê ji zarokê wê bêpar bihêle.<br>Di hin rewşan de, kesê/a saxmayî/rizgarbûyî xwe bi xwe ji malê dûr dikeve ji ber xweşermezarkirinê. |
| Mafê kar di nava rewşên dadmend û wekhev de (Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Madeya 6 ta 7) | Cudakirin û bertekên civakî yên neyênî li dijî kesên saxmayî/rizgarbûyî bandorê li karê wan û dema gera li kar dike. Ji ber şermezarkirinê, rêya peydakirina derfetên kar ên guncaw li ber wan tê girtin û dibe ku şermezarkirin bibe sedema berdanê ji kar.<br>Neçareserkirina encamên şermezarkirinê li ser tendirustîya derûnî, dibe ku karîna mirov a kar kêm bike. |
| Parastina Zarokan (Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û Siyasî, Madeya 24em, Peymana Navdeweltî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Madeya 10em) | Gelek caran zarokên ku encama destdirêjîyê ne tên jidestberdan û tevahîya jîyana xwe tên şermezarkirin dema ku bav nenaskirî be an navê wî ne eşkere be, her weha dibe ku bê nasname be jî ji ber ku nehatiye qeydkirin.<br>Tirsa ji şermezarkirinê dibe ku dayikan ber bi destberdana ji zarokê an kuştina wê ve bibin. |

| Mafên ku ji ber şermezarkirinê tên binpêkirin (li gor her du peymanan) | Şîroveya li gor rewşa li Sûrîyayê |
|---|---|
| Mafê Tendirustîya laşî û derûnî (Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Madeya 12em) | Bandora tundîyê û şokbûnê bi rêya dûrxistina civakî û şermezarkirinê, sînoran li pêş gihaştina xizmetan û piştgirîyê digire, ev sînor hin ji wan xweyî ne. |
| Mafê Fêrbûnê (Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Madeya 13em) | Şermezarkiria ji ber girtinê rêya çûyîna dibistanê an zanîngehê li ber kesê/a saxmayî/rizgarbûyî digire, çi ji ber xweşermkirinê be an ji ber şermezarkirina malbatî û nerîna civakê her weha tirsa ji girtinê, ku dibe kelem di rêya berdewamîya xwendina wan de.<br>Tirsa ji tundîya cinsî yek ji sedemên neçûna keçan ji bo dibistanan e. |
| Mafê beşdarîya jiyana civakî (Peymana Navdewletî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Madeya 15em) | Piranîya caran kesên saxmayî/rizgarbûyî xwe bi tenê dihêlin an ji civakê û malbata xwe tên dûrxistin, di encamê de, mafê xwe yê beşdarîya tekûz ji dest didin |



# 04

# Pênaseyên Qanûnî yên Hin Binpêkirinan

## Girtina Keyfî:

Grûpa kar a pêwendîdarî girtina keyfî diyar kir ku qedexeya ji azadîyê keyfî ye di van rewşan de: girtin an binçavkirina neqanûnî, her weha dibe ku girtin û binçavkirina qanûnî jî li gor pîvanên navdewletî keyfî bin, mînanî dema ku qanûn di deqa xwe de nediyar be an wateya wê fireh be an ne li gor mafên mirovî yên din be, mîna mafê azadîya derbirînê an mafê azadîya ji cudakirinê, û dibe ku girtin keyfî be jî ji ber binpêkirina mafê kesê girtî yê bidestxistina dadgehkirineka dadmend.
Her weha wendakirina bizorê û girtina sirî jî keyfî ne.
(International Trials Manual)

## Wendakirina bizorê:

Girtin, binçavkirin an revandin an jî çi cûreya nemana azadîyê, ku bi rêya karmendên dewletê an kes an grûpeka kesan ku bi piştgirî û pesendkirina dewletê kar dikin, diçe serî, paşê lixwemukirhatina girtinê an veşartina çarenûsa kes an cihê wî tê redkirin, di encamê de ji parastina qanûnî bêpar dimîne.
(Hevpeymana Navdewletî ya Parastina Hemû Kesan ji Wendakirina bizorê)

## Girtîyên Nerînê:

Kesên ku ne doza tundîyê kirine, ne jî bi kar anîne, lê ji ber nerînên xwe yên siyasî an derbirîna xwe an prespektîvên xwe hatine girtin

## Binçavkirina bêyî rêdana pêwendîyê:

Girtina kesan bêyî rêdana danûstendina li gel malbatê û parêze ...hwd

## Girtina Nepenî:

Binçavkirina kesan li cihên nepenî.

## Rewşên zindanan yên ne guncaw:

Rewşên girtîgehan, ji aporbûnê û zindankirina takekesî,

## Bêparkirina ji mafê hatûçûnê:

Qedexeya li ser azadîya hatûçûnê ji qedexeyên din li dij azadîyê cuda ye, ku mafê hatûçûnê an teng e an fireh e, nimûne dema ku fermanek hebe mirov li devereka destnîşankirî bijî (sînorkirina Niştebûnê), û ji bo nasîna gelo mirov ji azadîya xwe bêpar meye, Dadgeha Ewrpoî bal kişandiye ser rêje û şideta sînorkirinê, cûre, dem, bandor û şêwazên bicihanîna rêkarê û pêvajoya wê berçav girtiye, vam hêmanan karîna derketin ji devera destnîşankirî û rêjeya çavdêrîya li ser tevgerê li xwe girtine.

## Girtin, Sekinandin û Zindankirina Pêşdadgeh:

Bêparkirina mirov ji azadîyê bi rêya fermaneka desthilateka dewletê an bi erêkirina dewletê, gotina girtinê tê bikaranîn dema ku mirov tê girtin berî ku bi tometa tawanekê were dadgehkirin, dibe ku li deverekê girtî be û nebe jê derkeve, mînanî navendên polîsê, devereka girtinê, deverekê giştî, taybet an li jêr niştebûna neçar.

Di dozên tawanan de, gelek cûreyên girtina pêşdadgeh hene, mînanî girtina li navenda polîsê berî ku girtî dadwer bibîne. Gotina sekinandinê jî ji bo fermana dadwer ya girtinê ya berî dadgehkirinê tê bikaranîn, û bêparkirina ji azadîyê ji hêla endamekê polîsê an kesekê din li gor qanûnê, di dema lêpirsînê de, li xwe nagire.

## Zindan:

Gotina zindan tê bikaranîn ji bo nîşandana dema ku mirov ji azadîya xwe bêpar dimîne ji ber tawanekê. Ev gotin nîşana bêparkirina ji azadîyê piştî dadgehkirinê ye, lê girtin di pêvajoya dadmendîyê de tê wateya bêparkirina ji azadîyê, berî û di dema dadgehkirinê de.



# 05

# Qewîtî

## A- Qewîtîyên bo rêxistinên civaka sivîl ên Sûrîyayî:

- Hewldana dîtina bingeheka datayan ya yekgirtî ji bo jimartina girtîyan li Sûrîyayê û danîna têkilîyê li gel mîkanîzmên navdewletî yên pêwendîdar ji bo daxwazên başkirina rewşa wan û serbestkirina wan.

- Hevkarîya li gel rêxistinên civaka sivîl di warê guhastinê de û pêşkêşkirina piştevanîya pizîşkî, civakî, mirovî û qanûnî bo saxmayîyan/rizgarbûyîyan û malbatên wan.

- Hewldana jinûavakirina saxmayîyan/rizgarbûyîyan û vegerandina navdengê wan di nava civakê de, bi rêya workşopên rahênanê û peydakirina derfetên kar ên guncaw bo wan.

- Belavkirina hişmendîya çandî ya mafên mirovan bi rêya ragihandin, semîner û workşopan û xebatkirina li ser nehiştina nezanîya di vî warî de, nemaze şermezarkirina ku bi mirovê saxmayî/rizgarbûyî re dimîne temama jîyana wî û avakirina wî da ku vegere endamekê çalak di civakê de.

- Hevrêzkarî û alîkarîya ji bo betalkirina hemû madeyên qanûnî di qanûna Sûrîyayî de yên ku binpêkeran, çi be rêjeya berpirsyarîya wî, ji sezayê diparêze û çakkirina sîstema girtinê û zindanan û piştgirîya dadgehan da ku rola xwe ya jidestçûyî vegerîne.

- Xebata li ser dîtina mîkanîzmeka vegerandina mafan di qonaxa bê de, di dema dadmendîya veguhêz de û daxwazkirina vê yekê ji alîyên amadeker bo destûra nû, bi armanca garantîkirina vegerandina dadmend ya mafên qurbanîyên girtinê û yên wendakirina bizorê û malbatên wan li gel garantîyên nedûbarekirinê.

- Danîna programên alîkarîya rehetkirinê û avakirina derûnî û civakî yên demdirêj bo qurbanîyên zindanê û îşkenceyê.victims of enforced disappearance and their families, and guarantees of preventing recurrence.

## B - Qewîtîyên bo layanên Navdewletî:

- Aktîvkirina rola qanûna navdewletî di dadgehkirina tawankerên cengê û parastina mafên sivîlan di şerên çekdarî de.
- Bicihanîna hevpeymanên navdewletî yên tunekirina hemû cûreyên cudakirinê û tundîyê li dijî jinan.
- Bicihanîna hevpeymanên pakkirina rewşa girtîgeh û zindanan û dayîna rê bo rêxistinên pispor bo seredanên girtîgehan li Sûrîyayê.
- Fişara li ser Hikûmeta Sûrîyayî bo serbestkirina girtîyên nerînan û wendayên bizorê ji sala 2011an ve.
- Fişara bo jinûaktîvkirin û avakirina rêxistin û dezgehên niştîmanî yên serbixwe yên mafên mirovan bo parastin û çesipandina mafên zarokan.

## C - Qewîtîyên bo Neteweyên Yekbûyî û Layanên Herêmî:

- Tavilê destpêka bi fişara li ser hemû alîyan ji bo eşkerekirina lîsteyên girtîyan li gor dema girtinê, her weha eşkerekirina cihên binçevkirina girtîyan û dayîna rê bo rêxistinên mirovî û Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor bo seredana wan.
- Avakirina komîteyeka pispor a navneteweyî bo çavdêrîya wendakirina bizorê û lêpirsîna demlidest bo eşkerekirina çaranûsa bi hezarên wendayan li Sûrîyayê.
- Piştgirîya rêxistinên belgekirina rewşên wendakirina bizorê û girtina keyfî û îşkencekirinê û rêya lêpirsîn û dadmendîyê û mîkanîzmên wan her weha piştgirîya rêxistinên ku di warê jinûavakirina qurbanîyan de kar dikin.
- Fişara bo serbestkirina temenmezin û nexweşan yê ku pêkan e nexweşî bigihêje wan û jîyana xwe ji dest bidin.

- Veguhestina dosyayê li Sûrîyayê bo dozgerê giştî yê Dadgeha Tawanan a Navdewletî li gor beşa heftem.

- Garantîkirina bicihanîna biryara Encumena Ewlekarîyê ya der barê girtîyan de 2139 û biryarên pêwendîdar, ji hêla alîyên şer ve.

- Daxwaza bilezkirina derbasbûna Komîteya Lêpirsînê ya Navdewletî bo Sûrîyayê, li gel rêxistinên din ên pêwendîdarî mafên mirovan û rêxistinên mirovî.

- Avakirina navendeka pisporî lêkolînên îşkencekirinê û peydakirina xizmetên pizîşkî bi awayekê rotînî bo hemû girtîyan.

## D- Qewîtîyên bo Komîteya Destûrî

- Tevlêkirina madeyên eşkere yên qedexekirina avakirina dadgehên awarte di destûra nû de.

- Tevlêkirina madeyên qedexekirina dadgehkirina sivîlan li pêş dadgehên leşkerî, di destûra nû de.

- Tevlêkirina madeyên serxwebûna desthilata dadgehî û rêkaraên sekinandinê û garantîyan di nava destûra nû de.

- Danîna mîkanîzmên çalak yên çavdêrîya karê dezgehên ewlekarîyê û deverên girtinê di destûra nû de.

## E- Qewîtîyên bo serkirdeyên hêzên leşkerî yên ku kontrolê li ser deverên ji derveyî desthilata rêjîmê dikin

- Rawestandina hemû kiryarên girêdayî girtin û binçavkirina keyfî.

- Dayîna rêya gihaştina bo xizmetên qanûnî û pizîşkî bo hemû girtîyan.

- Serbestkirina demlidest ya girtîyên nerînê û kesên ku ji ber mafên xwe yên mirovî û derbirîna nerînên siyasî hatine zindankirin.

- Pabendîya bi hemû pîvanên navdewletî û hevkarîya di gel hemû rêxistinên pêwendîdarî proseyên girtinê û binçavkirinê li deverên di bin kontrola wan de.

- Serbestkitina kesên binçavkirî yên ku binçavkirina wan digihêje asta bêparkirina keyfî ji azadîyê.

Armanca îşkencekirinê ne tenê wergirtina agahîyê ye, lê wêrankirina kesaytê bo belavkirina tirsê di nava civakê de, bi rêya têkbirina têkilî û pêşbînîyan û wêneya mirov li ser kesayeta xwe, ji lew re, danîna lomê li ser qurbanîya û malbatên wan balê û xebatê ji ser tawankeran hiltîne, her weha bala mirov dûrî koka sedemên binpêkirinan li Sûrîyayê dixe û li pêş rehetkirinê dibe asteng, her weha dibe sedema zêdebûna parçebûnê û nakokîyên di nav civakan de, derfetên aştî û geşepêdana domdar lawaz dike, tevlihevîyê çêdike û pêkan e dadmendî û lêpirsîna li dijî tawankeran asteng bike.

Piranîya caran şermezarkirina pêşbînîkirî û ya hundirîn li cem kesên saxamayî/rizgarbûyî, dibe asteng li pêş eşkerekirina bûyerên ku bi wan re derbas bûne û wan ji wergirtina alîkarîyê an gihaştina bo dadmendîyê dûr dixe, ev hestê şermezarîyê li nav malbatan dikare girêdanên malbatî hilweşîne û kesên saxmayî/rizgarbûyî werin qewitandin, bitenêhiştin an dûrxistin û di asta herî xirab de, ev şermezarkirin dikare bibe sedema kuştina di bin navê namûsê de.

2022
© Hemû maf parastî ne bo rêxistina The Day After